

Ezidische Jugend e.V.

# Cejnên Êzîdiyan - Batizmî

---

Mejdîn Kurt

05.12.2011


# Cejnên Êzîdiyan - Batizmî

Mejdîn Kurt

Di destpêka salên ku Êzîdî ji welatê xwe reviyar û heya niha jî gelek ji wan nizanin bê cejnên wan kengî tîr pîroz kirin. Û herweha jî zanîna nivsên nû di derbarê dem û pîrozkirina cejnên wan de gelek kêr û tevlihev e.

Di Salên bihûrtî de Êzîdiyan hinek cejnên xwe ne bi hev re pîroz kirin, ji ber sedema ku fikrê wan di derbarê dema van cejnên pîroz de ne yek bû. Hina dixwest ji bo pîrozkirina cejnên xwe demekê deynin û hinek din digotin „hemû cejnên me ne bi danîna demê tîr pîroz kirin, hinek hen e ku bêtir pîroz kirina wan bi rojên dinava heftiyê de girêdayin e“.

Bi rastî jî, wek ku ev di mîtolojiya Ola Êzîdiyan de jî xûya dik e, girêdana pîrozkirina cejn bi rojên nava heftiyê de gelek pêwist e.



## Nimûne: Çarşema Sor

Roja çarşemê li ba Êzîdiyan gelek pîroz e û hemû kar di wê rojê de qedexeyê. Ev cejn di Çarşema yekemîn ya di gulanê de tê pîroz kirin. Sala 2003 ev cejn ket 14ê meha gulanê bi hesabê salnava gregorî (al. Gregorianischer Kalender) û sala 2004 ev diket 19. meha gulanê. Tiştêk din gelek pêwist di derbarê salnava Êzîdiyan de heye: Salnava Êzîdiyan 14 rojan piştî salnava ewropî destpêdik e. Yanî, 14ê mehê bi hesabê ewropî dibê 1ê mehê li ba Êzîdiyan û 13ê mehê di salnava ewropî de dibê roja dawî di meha bihûrtî de li ba Êzîdiyan.

Hinek cejnên ku di vir de hatin e danîn ne li ba hemû Êzîdiyan tîr pîroz kirin. Bi taybet ez dixwazim hinek li ser îdên ku li ba Êzîdiyên Tirkiyê tîr pîroz kirin binivîsim. Ji xeynî van cejnên hinek din hene ku tenê li dora Lalisê an jî li deverên ku Êzîdî lê dijîn tîr pîroz kirin.

Ger min di vir de cejnên pîroz ji bîr kirib in, ji kerema xwe re hûn karin di derbarê wan cejnên de binivîsin. Hemû demê ku di vir de hatine danîn li gor salnava ewropî hatine danîn.

## 1) Batizmî (Îna dûyemîn piştî Îda Êzîd)

Dibe ku hinek ji xwendevanan li pey vê gotina min ya di derbarê Batizmiyê de haciz bibin lê dîsa jî ez dibêjim bi gomana min ev cejn cejna herî mezin e di nav Êzîdiyên Kurdîstana Tirkiyê û herwiha yê Sûryê û belkî di nav tevaya Êzîdiyan jî de, ji ber ku ev cejn bi tevayî deh rojan tîr pîroz kirin û amadekirina vê cejnê jî ji zû ve tê kirin. Sedema ku tenê hinek Êzîdiyên Kurdîstana Tirkiyê û Kurdîstana Sûryê vê cejnê pîroz dikin ev e:

*Dibêjin Pîr Alî li dora Mêrdînê şivanê Rehbikêkî Fileh bû. Tikesî nizanîbû ew bi rastî kîya û ji kû hatiya. Dema havînê şivanên gundiyan ji zîlamê Fileh re gotin „ev şivanê te guh nade pezê te. Me ew di vê kela havînê de hê carekê jî nedîtiya ku pezê te aniye ser avê“. Ji ber ku pezê Rehbik gelek baş xuya dikir û wî ti kêmasî li pezê xwe nedîtibû ew gelek şaş ma û dixwest taqîbê li şivanê xwe bik e ku bibîne ka ew gotinên şivanên gundiyan rastin yan na.*

*Ew bi dizî li pey şivanê xwe çû û dît ku hemû pezê wî li dora şivên kom bûn û şşvanê wî darê xwe di herdê de çikand. Bi çikandina darê şivên di herdê de av ji herdê derket*

# Cejnên Êzîdiyan - Batizmî

Mejdîn Kurt

*û hemû mîh û pezê wî ew av vedixwarin. Dûra wî darê xwe ji herdê derxist û ew av wînda bû.*

*Zîlamê Fileh gelek şaş ma û taqîb heya êvarî li şivanê xwe kir. Bi windabûna rojê re wî dît bê şivanê wî çawa dihe dikir. Wê gavê Rehbik famkir ku şivanê wî şexsekî bi sirra xwedê ye û ew êzîdiye. Dûra Rehbikê Fileh hefûya xwe ji şivanê xwe xwest ku wî taqîb li şivên kiriya û got „ez zanim tu kiyî, ji niha û pêde gereka tu dev ji şivantiyê berde û ez bi tevay te biçim ba milletê te“.*

*Pîr Alî (Piyalî) tevî Rehbik cûye ba milletê xwe li Tûr Abidin û Rehbik ew bi wan dayî naskirin, lê baweriya wan pê nedihat. Dûra wan ji herdû mivanan re çêlek ser jêkirin û piştî ku Pîr Alî ew çêlek dîsa sax kir milletê wî ecêbmayî ma û ew wek „Tawis-Melek“ dîtin.*

Bi vî hawayî jî navê milletê wê derê bûye Çêlkî û Pîr Alî çûye nav Qelaçvaniya (Torê) û ji sedema ku ew pistî heft rojan ji nav Çêlkiya çûye ba Qelaçvaniya, ev cejn heftiya pêşin li ba Çêlkan û dûra heft rojan li ba Qelaçvaniya tê pîroz kirin. Li vir ew wînda bûye û tikesî ew nedîtiya. Lê belê wek min got, ev cejin li ba hinek Êzidiyên Sûriyê jî tê pîroz kirin. Çêdibê ku ev Êzidiyên Sûriyê hinek ji Êzidyên Çêlkî bin, yen ku ji wan deran reviyane.

Min ev agahî ji devê bavê xwe û ji pirtûka Ferhun Kurt (Die verlorenen Enkelkinder Adams) girtina.

*Li welêt pîrozkirina vê cejna pîroz wiha bû:*

**a)** Îna dûyemîn ya piştî Îda Êzîd destpêk bû. Vê rojê Şêxan û Pîran wê hevîrtirşê ku wan bi destê xwe çêkiribûn ji bo cêkirina sewik/nan li nav hemû gundên Êzîdiyan bigerandina û serê malê hinek didan wan. Wexta ku hevîrtirşê têra gundiyan nedikir, wan karibûn wî hevîrtirşê li nav hinek din xînin û li hev bar bikin. Bi vî hevîrtirşê Êzidiyan dûra sewik ji bo Piyalî (Pîr Alî) û Nanê miriyan cêdikirin.

**b)** Semîyê roja cilşoyê bû. Her şexsî vê rojê xwe û kincên xwe dişîşt, malên xwe paqij dikirin û bi vî hawayî xwe ji bo cejnê amade dikirin.

**c)** Yekşem, dûşem û sêşemê Nanê Miriya dihat dayîn. Wan pez digurand û ew goşt tevî nan li nav gundiyan gêrandin. Ev xwarin ji bo Miriyan û bîranîna wan hat dayin. Berî vê demê mirov çend pez ji bo van rojên taybet nîşan dikirin û herwiha jî pezek ji bo roja Şîlanê heya. Ji vê pezê 7 perçên şîlanê tên danîn. Di heman demê de jî, roja Dûşemê, sêşemê û çarşemê, rojiyên Pîr Alî (Piyalî) ne.

**d)** Çarşemê pez-gurane. Mirov di vê rojê de pezê ku wan berî çend mehan nîşan kiribûn gurand û bi taybet her hindik pezek ji bo şîlanê, yanî êvara Pîr Alî digurandin û perçê şîlanê ji êvara din re amade dikirin. Ew perçe bêxwê dihat kelandin û ji dohnê (zeyta) vî pezê mirov çira (fitîl) çedikir. Ew Perçe û Serî û Piyê Sersalê divî bû ji peza ku pêşin dihat gurandin bûna. Ew her heft perçe jî, yê ku ji şîlanê re hatin çêkirin evin (her heft perçe ji aliyê rastê hatin cêkirin):

- 1) 7 parso
- 2) sêngik (temamî)
- 3) refsik (pol)
- 4) qulik

## Cejnên Êzîdiyan - Batizmî

Mejdîn Kurt

5) girdik

6) piştîsk (ji ber rahn)

7) peyîk (yê paş yan jî yê pêş)

**e)** Pêncşemê ger û pîrozkirin û êvarî şîlana, yanî êvara Pîr Alî ya. Ev roj gelek pêwist bû û bi taybet mirov karê bêje ew roja zarokan bû. Hemû kes diçû ba hev û cejna hevdû pîroz dikir. Zarokan jî çentê/tûrikê rengîn bi xwe re dibirin û li nava malan digeran. Wan li deriyan xist û gava mirov derî vedikir wan gotin “serê salê binê salê xwedê kurekî bide kebanîya malê” û wan tûrikê xwe vedikir, divê millet jî fêkî û şêranî bidana wan. Ji vê rojê re goşt, birinc, mehîra/danika Rehb, ya ku bi kesk hatî cêkirin, sewik



(nan) û tirşika mişmişan hate hazirkirin û mîvanê ku ji derî bihate û milletê nava malê wê ev xwarin bixware. Çima mehîra Rehb? Tê gotin ku wê demê Rehbikê Fileh bi rojî bû û ji ber sedema ku goşt û tiştên bi dohn di dema rojiyên Filehan de li wan qedexe bû, rehbik ji milletê Êzîdî mehîr dixwest. Berî ku roj biçûya ava divê mirov şîlana xwe bikire û ew jî wiha bû:

Berî her tiştî mirov ji bo Pîr Alî doşekê û balgîh didanî (Êzidiyan ji bo mîvanan her dem doşek û balgî danî), her heft perçên goşt, yên ku bê xwê hatina kelandin, di sifrikê de didanî, pakêtek cixare tevî xwêfidankê li ser sifriyê didanî û her car cixarek pêdixist, wexta yek xilas dibû. Ji bilî van tiştan jî divê heft sewik (nan) li ser sifriyê bûya û firaxek tijî mewîj û li balê jî çira (fitîl), yên ku mirov bi dohnê pez cêdikir, hebûna. Her kesê nava malê dûra yek bi yek li ber doşekê rûdinişt, ji wan ciran yek pêdixist, ew di nav mewîjan de didanî, herdû destên xwe pêşî dida ber germiya fitîlê û bi vî hawayî dihe dikirin û ji Piyalî xwestekên xwe gotin. Piştî ku roj çû ava û her kesên nava malê xêr û silametî bi dihê xwe re ji Piyalî dixwest û piştî ku çira vedimirîn, sifri hate hilanîn û mirov ew goşt ji rojên din re hilanî. Pêwist e ku, berî mirov vê sifriyê li mala xwe deynî, wê tevî vê xwarinê bibe mala Micêwir û ew ji xwe re hinek ji wê xwarinê bibe. Di heman rojê de jî Îda Pîr Alî (Piyalî) ye.

**f)** Şeva pêncşemê Şevronk e. Vê şevê heya roja îne sibê saet şeşan millet ne diraza û ji xwe re çîrok digotin û şahî dikirin.

**g)** Roja Îne roja razan û veysandinê ye. Vê rojê kesen kû şevronk cêkirina ji xwe re radizin û xwe rihet dikin.

**h)** Şemiyê êvarî Kalike. Roja şemî mirov diçê ba hev û sersala hevdû pîroz dike, ji ber ku êvara şemiyê êvara serê salê ye. Lê tiştê her pêkenok û pewist di vê êvarê de pêk dihat. Ew jî Kalikê Sersalê bû. Dû gêncan, an jî dû zilaman, xwe xemilandin, yek bi kincên pîrekan û yê din bi kincên kalemêrekî û wî ji xwe re bi hiriya mihan rih cêdikir. Herdû bi hev re mal bi mal digeriyan, bi tirş li deriyan

## Cejnên Êzîdiyan - Batizmî

Mejdîn Kurt

dixistin, wexta derî hate vekirin wan digot “serê salê binê salê xwedê kurekî bide kebaniya malê”, diçûn hindûr, gelek tinaz û henek dikirin û ji xwedyê malê pere dixwastin. Wexta ku xwedyê malê pere nedidana wan, wan darê xwe li ser berosa

“serî û piyan” digerand û xwestin wê birijînin. Ev serî û pî yên pezê ku ji cejnê re hatiya gurandin bûn û hemû gundiyan ew wê êvarê tevlî hinavan (zik, kezeb û hwd.) cêdikirin. Paşê wan herdûyan ew perê ku dane hev li hevdu par dikirin.



**i)** Roja yekşemê Sersal bû. Her kesî di vê rojê de şahî dikir. Sal hebûn ku milletê Çêlkiyan bi rojan û bi heftiyan jî bi şahî û dîlan ev cejn pîroz dikirin.